

Nameyên Sersaxiyê

Xwîşk û birayên hêja, malbt û dostên hevalê nemir Isma'îl Omer....

Heval û dostên hêja, endamên Partiya Yekîti ya Demokrat a Kurd li Sûriyê,

Ez bi dilekî êş , xemgîn , hesret bi dilovaniya serokê Partiya we, Nemir Isma'îl Omer aghadar bûm.

Mixwabin, mirin rastiyeke tehil e û ji mirovan nayê qebûl kirin, û ev rastiya tehil beşek ji jiyane ye.

Tiştê herî giirng ew e, hevalê me yê nemir Isma'îl Omer bi fidakarî û nêrinên xwe yê rêzanî rasterast di doza tevgera Kurd a azadî û aştîxwaz de li ba gelê Kurd ciyê serfirazî û pîrozbahiyê ye.

Ev rastiya han, pêwîstiyêke zor giran dide ber çavan. Yê ku ji endam, heval û dostên Partiya Yekîti tê daxwaz kirin ev e: Divê rêz û milên xwe bidin hev û xebatê ji bo azadî, aştî u wekhevîyê geş bikin. Divê jiyana û ramanên nemir Isma'îl Omer - weke rêzanî- ciyê xwe rojane, di xebata Partî de bigre.

Bila serê gele Kurd sax be.

Nemrin ji bo heval Isma'îl Omer û cangorên Kurd re.

Edhem Reşîd

Behî name

Di serî de gelê kurd , tevaya heval û hogirên wî , malbata xwedê jê razî , kes û nasê wî , bere serê wan hemiyan sax be . Bi xem û kovaneke mezin me koçîdawîbûna mamoste Isma'îl omer "serokê Partiya Yekîti ya Demuqrat a Kurd li Sûriyê "bihîst, em bi hest û can peşdarî vê behiyê dibin û zor em bi hêvî ne, ku hûnê vê bûyerê bi sebir û aram derbas bikin . Dîsa jî, ji Partiya Yekîti re serkeftin di kar û xebata paşerojê de , ji xwedê jê razî re lê bêbûrîn û bihişt , ji malbata wî re hedan û sersaxî û temenekî dirêj.

Nivîskar: Xelîl kalo

Nameyên Sersaxiyê

Sersaxî

Hevalên hêja, serkirdayetî û endamên Partiya Yekîti ya Demuqrat a Kurd li Sûriyê – YEKÎTÎ –

Bi dilê xemgîn, ku kul û keseran şûnên vala tê de nehêstine, min vê nivroyê xemgîntir nûçe ji medya Kurd wergirt. Çûyîna kekê hêja, xebtakarê dilsoz Îsmalî Omer wek birûskê li dil û derûna min da, ez tengijandim, hemî derd û kulên min dan alîkî, û şûna wan hemiyan stand. Bawer bikin, ku her çiqas ev çûyîna bê vegeer bi we tehl û tîrş be, sedema daxên giran be jî, ew bi min û bi her kesên dilsozên doza gelê xwe, ku li van welatên mişextiyê dimînin, û bi hezarên kîlometran ji we û ji welêt dûr in, girantir û diwartir e. Kekê Îsmalî ne tenê ji xwe, malbata Emo û partiya xwe re bû, belê wek ku hemî kes dizanin, ew berî pêşî ji tevayê gel û welatê xwe re bû. Tevaya jiyana xwe ji bo erk û armancên gel û welatê xwe re terxandibû. Vê lomê wê di bîriya miletê xwe de her zindî bimîne. Her çiqas ev çûyîna zû û bi lez daxên dilan xwînzê dike jî, lê ez hêvîdar im, ku domkirina rê û rêçika wî , dê gelek birînan bikewîne.

Aramî ji bo me hemiyan, û dilovaniya Xweda û bihişt ji bo hevalê me yê dilsoz.

Bira û hevalê we Heyder Omer

Almaniya . 18an. 10. 2010

Lêborîn:

Ji ber ku birûskên sersaxî , helbest û gotar gelek bûn, me nikanî tev biweşandana. Em ji wan lêborînê dixwazin